



# **RAPOR**

## **DERHEQÊ BINPÊKIRINA MAFÊ MIROVAN YA GIRTÎGEHA EWLEHIYA BILIND A JIMAREYA 2. YA XARPETÊ**

**LIJNEYA ŞOPANDINA GIRTÎGEHAN YA BAROYA AMEDÊ  
ŞAXA AMEDÊ YA KOMELEYA MAFÊ MIROVAN (ÎHD)**

Werger: Parêzer Hasan YALÇIN

**23 SIBAT 2018 - AMED**

## **DESTPÊK**

Girtîgeha Ewlehiya Bilind a Jimareya 2. Ya Xarpetê ku li nav Kampusa Saziya Înfazkirina Ceza a Xarpetê cîh digire de piştî ku di çend rojê dawî bi êşkence kirin û lêdan kirina girtîyan re hat rojevê, xizmên girtîyan ji roja duşema 19.02.2018'an de bi awayekî zêdeyî serî li Baroya Amedê û Komeleya Mafê Mirovan xistin. Bi çarçoveya ev serlêdanên malbatê girtîyan, Lijneya Şopandina Girtîgeha ya Baroya Amedê û endamê Komeleya Mafê Mirovan ya Şaxa Amedê bi şandeyekê di roja 21.02.2018'an de serlêdana Girtîgeha Ewlehiya Bilind a Jimareya 2. Ya Xarpetê kir û raporek amade kirin.

Kesê ku di şandeyê cîh girt;

- Endamê Rêveberiya ÎHD'ê ya Şaxa Amedê Prz. Hasan YALÇIN
- Endamê Saziya ÎHD'ê ya Şaxa Amedê Prz. Gurbet YAVUZ
- Endamê Lijneya Şopandina Girtîgeha ya Baroya Amedê Prz. Önder ALÇIÇEK
- Endamê Lijneya Şopandina Girtîgeha ya Baroya Amedê Prz. Hazal ÖZBEY
- Endamê Lijneya Şopandina Girtîgeha ya Baroya Amedê Prz. Şerzan YELBOĞA

## **SERLÊDANÊN HATÎBÛ KIRIN YÊ BERÎ LÊKOLÎNÊN ŞANDEYÊ**

**Hayriye ÖZER**, di roja 19.02.2018'an de ji bo kurê xwe yê girtî Serkan Özer serî li Komeleya Mafê Mirovan ya Şaxa Amedê xist û ev tişt anî ziman: *“Kurê min Serkan ÖZER, nêzî saleke li girtîgehê dimîne. Niha li Girtîgeha Jimareya 2. ya Xarpetê de cezayê xwe înfaz dike. Îro saet di 11.00'an de bi kurê xwe re min hevdişînek telefonê kir û ev tişt ji min re got: Ji aliye Rêveberiya Girtîgeha Xarpetê qasî 4 roje tê êşkence kirin û derb kirin, rojê 2 caran rastî lêdana wan tên. Ev tişt ji min re got ku bi pêkhatayê keyfî rastî êşkenceyê hatine hiştin. Êdî nikare li ber sepandinê wan ber xwe bide. Em wekî malbata wî ji ber vê rewşê pirr diêşin. Em jî nizane êdî çî bikin. Ji ber jiyana kurê xwe em bi fikir in. Tu ewlehiya jiyana wan tune ye. Ji bo ev zordarî û tundî bi dawî bive em daxwaza piştgiriya hiqûqî ji we dikin.”*

**Kemal ZAMAN**, di roja 19.02.2018'an de ji bo kurê xwe yê girtî Fırat ZAMAN serî li Komeleya Mafê Mirovan ya Şaxa Amedê xist û ev tişt anî ziman: *“Kurê min Fırat ZAMAN, qasî salek û nive di Girtîgeha Ewlehiya Bilind ya Jimareya 2. a Xarpetê de dimîne. Di hevdişîna ku min bi telefonê bi wî re kir, kurê min ev tişt qal kir. Gellek reqîb rojê 2 caran tê hindurê odeya me û dixwaze ku bi sekna li ser piyan em bisekine û em jimareyê bidin. Ji ber ku em vî tiştî napejirînin, me derb dike, heqaret li me dike, zilma ku digêje êşkenceyê pêktînin. Birîndar çêdibin. Wekî bav ji ber jiyana kurê xwe ez bi fikir im. Em vê zilmê qebûl nakin. Di derbarê vî tiştî de em dixwaze ku şandeyek herin girtîgehê û piştgiriya hiqûqî bide me.”*

Her wekî din di navbera dîroka 19.02.2018 û 20.02.2018'an de malbatê girtîyên wek **“Mustafa YİĞİT, Metin BENİCE, Enver TOPTAŞ, Cihan GÖKALP, Aziz YAŞA, Naşit KIZILKAYA, İhsan TARIKUT, Nesih DERİNER, Yasin GÜNGÖR, Yavuz YAVUZ, Ekrem ÖNCEL”** di derheqê angaşten êşkenceyê serî li Komeleya Mafê Mirovan ya Şaxa Amedê xistin.

## **ZANISTIYÊ GIŞTÎ DÎ DERBARÊ HEVDÎTINAN DE**

Kampusa Saziya Înfazkirina Ceza a Xarpetê ev demeke dirêj e, bi çêbûna bînpêkirinên giran yê mafê mirovan, odayên singer, bi çêbûna derb-êşkence û kiryarên xirab, wek girtîgehekê ji rojevê raya giştî dernakeve. Herî

dawî di roja 19.02.2018'an û vir de gellek serlêdan li saziyên me hat kirin ku girtî rastî êşkence û derb kirinê tên.

Bi armanca ku ji bo van angaştê lêkolîn bikin û tespîtan bikin, şandeya me di serlêdana Girtîgeha Ewlehiya Bilind a Jimareya 2. Ya Xarpetê de bi girtîyên wek Mustafa YİĞİT, Mehmet Sıddık AYAZ, Bahattin KESKİN, Abdülcelil KESKİN, Serkan EREN, Ergin DOĞRU, Metin BENİCE, Ekrem ÖNCEL, Enver TOPTAŞ, Hüseyin SOLMAZ, Bedri ÇAKIN, Naşit KIZILKAYA re hevdîtî çêkirin.

**Metin BENİCE**'yê (1984) ku li Girtîgeha Ewlehiya Bilind a Jimareya 2. Ya Xarpetê de girtî dimîne, ev tişt anî ziman. *“Ji Sibata sala 2016'an û vir de ez di girtîgehê de dimîne. Herî dawî 3 meh berê ji Girtîgeha Rize Kalkandere ya Tîpa L'ye de min neqlî vir kir. Dema ku min neqlî vir kir, di tîketîna girtîgehê de em rastî lêgerîna tazî hatin. Her çiqasî ku em li hemberî vê lêgerînê hatin jî, dîsa bi darêzorê lêgerîna tazî kirin. 3 meh berê dema em neqlî vir bû, me xistin odeyek 3 kesî. Lê belê em di odeyê 2 kes dimîne. Her sibe saet di 07.30'an de deriyê hewadarkirinê tê vekirin û êvarî saet di 16.30'an yan jî saet di 17.00'an de tê girtin. Cilên ku min ji Girtîgeha Rize'yê anî bû, nexistin girtîgehê û radestî malbata min kir. Têra xwe ji derfetên cilan sûdê nagirin. Rojname bi awayekî sînorkirî dide me. Ji ber ku hîn ez girtî me, ji 2 hefteyan carekê hevdîtîna telefonê dikim. 3 meh bûye ez li virim, lê min carek tenê hevdîtîna vekirî kir. Dema ez neqlî vir bûm, li girtîgeha Rîzeyê jimartin çawa dehat kirin, li girtîgeha vir jî bi vî şewazî jimartin dehat kirin. Heta roja 16'ê Sibata 2016'an de dema peywirdarê girtîgehê dehat odeyan bêyî ku pirsgirêk derkeve, jimartina xwe dikirin û ji odeyan vediqetiyên. Lê ji vê hefteyê û vir de di jimart girtinê de guhertin çêbûn. Ji 16'ê Sibata û vir de dema ku jimartin ewê bê kirin, 8-10 kes reqîb bi hev re hindurê odeyan û dibêje ku rabin ser piyan û bi awayekî rêzkirî bisekinin. Dema ku em li hemberî vê rewşa –derhiqûqî- bertek nîşan dide, min û hevalê min yê odeyê bi darêzorê ji ser kursiyê radikin. Di nava vê hefteyê de her cara ku ji bo jimartinê hatin odeyê bi zorê bi milê min digirin, ji ser kursiyê radikin û min bi hişkayî davê derveyî odeyê. 2 kes bi milê min digire û yekî ku ez rûyê wî nabînim di dawîya min de pihênê davêji min. Ji ber ku min hişkayî davêji derve di çonga min ya çep û enîşka milê min ê çep de birîn û şînayî çêbûye. Ev 2 rojê dawî bi kamereyan tê hindurê odeyê. Bêyî ku tu dengê xwe bikin zabitnameyekê digirin û ji odeyê vediqetin. Ji ber van bûyeran me danezana sîc ligel rêveberiya girtîgehê û dozgeriyê kirin. Vê sibehê li girtîgehê me îfade da. Ji ber ku me danezana suc kir, îro piştî nîvrojê me derxistin revîrê. Min ji bijîjk re rewşa xwe vegot. Min got ez hatiye derb kirin. Ji ber ku hefteyek li ser çûye, min got ku dewên lêdanê ji holê rabûye. Lê ji ber ku xwendin û nivîsandina min tune ye, ez nizanîm ku çî di hundirê rapora lêdanê de nivîsandiye. Ji doh û vir de tu tundiyek fizîkî li hemberî me çênebûye. Kesên ku ji bo jimartinê tê, tenê reqîb in. Lê belê di nav wan de ez rûyê wan cara pêşî dibînim jî heye. Her wekî din dixwazim ku ev tiştî bîn ziman ku ji zaroktiya min heta niha nexweşiya min ya tîfo heye. Amajeyê vê nexweşiyê car carna çêdibe. Dema ku ez hat vê girtîgehê min ji bijîjk re got ku nexweşiya min ya tîfo heye, min got ku pêwîste ku ez tedawî bivim. Lê belê rêveberiya girtîgehê heta niha tu hewldanek nekir.*

**Ekrem ÖNCEL**'ê ku li Girtîgeha Ewlehiya Bilind a Jimareya 2. Ya Xarpetê de girtî dimîne, ev tişt anî ziman: *“Nêzî 9 meh bûye ez li vê girtîgehê dimîne. Di odeyê bi giştî em 3 kes in. Ji 16'ê Sibata û vir de ji ber jimartinê em bi rêveberiya girtîgehê re pirsgirêkên cidî dijî. Niha dema ku jimartin bê girtin 10-15 hev peywirdarê girtîgehê bi awayekî giştî dikeve hindurê odeyê, dixwazin ku em ji ser kursiyê rabin, piştî bi awayekî rêzkirî li ser piyan bisekine û jimartinê bidin. Dema ku em li hemberî ev tiştî denge xwe dike 2-3 kes bi milê me digire û bi darêzorê me ji ser kursiya, çiyê ku em lê rûdinê radikin. Ev rewş heta doh êvarî yanî çend roje berdewam dike. Her cara ku ji bo jimartinê hatin odeyê hevalê min Ahmet OKAN derb kirin. Li paş stûyê wî û li gellek çiyê bedena wî şînayî heye. Di linge wî de pirsgirêkên cidî hene, ji ber êşa lingê xwe di xewê de zorê dikşîne. 2 cara tundiya fizîkî li min jî kir. Bi awayekî hişkayî milê me dijdîne û me davêje derve. Ji bo ku em rapora lêdan bûyîne bigire me serlêdan kirin, lê belê hîn jî me nebiriye nexweşxaneyê. 2 roj berê me ji ber van pêkhatayan bi daxwaznameyekê serî li dozgerî û Wezareta Dadê xistin. Ji doh êvarî û vir de bi kamereyan tê jimartinê dikin. Ji doh û vir de dema ku tê denge xwe qet nakin, tenê zabitnameyekê digire û ji odeyan vediqetin. Her wekî din ji ber vê mijarê tiştê ku me bihîstiyê eve ku di odeyên din de yek jê lêva wî çeriyaye û yek jî pozê wî şikestiyaye.*

**Ergin DOĞRU**'yê ku li Girtîgeha Ewlehiya Bilind a Jimareya 2. Ya Xarpetê de girtî dimîne, ev tişt anî ziman: *“Qasî 10 meh bûye ez li Girtîgeha Xarpetê ya Jimareya 2. di hucreyek yek kesî de dimîne. Ji roja ku ez hatim vir heta niha ji bo ku ez derbasî odeya 3 kesî bivim gellek cara serlêdan kirim. Lê serlêdanê min bê bersiv ma û hîn jî ez tena sere xwe dijîm. Di 15'ê Sibata 2018'an de reqîbên ku hatin hucreya min ya yek kesî ev tişt ji min re got: “ji niha pê ve pêwîste ku di dema jimartînê de tu li ser piyan bisekine eger tu ranebe ser xwe emê zabitnameyê bigirin. Di 16'ê Sibata 2018'an de fermanberê ji bo jimartînê sere sibehê hat bi awayekî dengê bilind ji min re got: “rabe ser xwe ûlan”. Piştîre bi milê min girt û min ber bi derî dehevdan. Serê min û rûyê min li derî ket. Ji wê rojê û vir de di pozê min de êş heye. Ji ber vê bûyerê min bi serfermanber re hevdişînek çêkir. Min got ku ez birîndar bûye, di ser çavê min yê rastê şînayê çêbûye ji ber vê sedemê pêwîste ku ez herim revîrê. Lê belê tevî van gotinê min jî bi saetan ji bo ku ez herim cem bijîjk hatim sekinandin. Saet di 4'an de dema ez çûm revîrê bijîjk ne li ciyê xwe bû. Min ji peywirdarên tenduristî yê li revîrê de çavê xwe nîşan da û xwestim ku ji bo ev rewşa min zabitnameyekê bigire. Lê got ku tiştêkî wisa nikare bikin. Lê dîsa ji bo vê rewşa min ya giran min bi daxwaznameyan serî li Dozgerî, Wezaretê Dadê û Lijneya Mafê Mirovan ya TBMM'yê xistim. Li ser rewşa min çend roj derbas bû lê hîn jî min nebiriye ligel bijîjk. Kesê ku li min lêda ez kare teşhis bikim. Di 18'ê Sibata 2018'an de di jimartîna sibehê de kesê ku ez kare wan teşhis bikim dîsa hate hucreya min û bi dengê kelew got ku “rabe ser xwe ûlan”. Piştîre li piştî min pihên lê xist û min xwe negirt, ez ketim erdê. Dîsa piştî vê bûyerê min nebîr revîrê. Di êvara 20'ê Sibata 2018'an de dev ji jimartîna ya bi ser piyan berda. Lê belê vê carê jî bi kamereyan tê odeyan û min dikşîne, diçîn. Ev rewş jî min pîrr êşand. Lewra di hucreyek yek kesî de ez dijîm, israrkirina bi jimartîna vî şêwazî min pîrr dişkîne. Ev rewş bi tena serê xwe bînpêkirina mafekî ye. Libat û tevgera xebatên girtîgehê êrîşkar û tehrîkkar in. Ji ber vê sedemê ez bawer nakim ku li vir ewlehiya me ya jiyânî heye. Çalakiyên civakî û spor pîrr pîrr kêma. Beşek pirtûk qet nade me. Beşek pirtûkên din jî ji aliye rêveberiya girtîgehê bi şêwazek hişmendî ya jî bê hişmendî tê wendakirin. Pirtûka Selahattin DEMİRTAŞ ya bi navê “Seher” nade me. Hetta ji ber ku di pirtûkekê Mucahit BİLİCİ de peyva “Kurd” derbas dibe, neda min. Nameyên me pîrr dereng digêje hevalên me, êwan jî pîrr dereng tê, ya jî qet nadin me. Hinek rojname û kovar qet nadin me. Sedema nedayîna wan jî nêzikatiya nûçeyên sendiqayê nêzî rêxistinê nîşan dide û vê rewşê jî ji bo girtîgehê wek metirsiyekê dibîne. Ji bo xizmetên tenduristiyê tadeyên pîrr em dikşîne. Ji bo em biçin revîrê her tim daxwaznameya didin. Lê çûyîna me ya revîrê meha dibîne.”*

**Enver TOPTAŞ**'ê ku li Girtîgeha Ewlehiya Bilind a Jimareya 2. Ya Xarpetê de girtî dimîne, ev tişt anî ziman: *“9 meh bûye ez li Girtîgeha Xarpetê ya Jimareya 2. de dimîne. Li vir 3 meh di odeyek yek kesî, 6 meh jî di odeya 3 kesî de ma. Nexweşiyên wekî şeker, kolestrol, kezêb, piştberketin û hilandina hestîya li min heye. Bi awayekî rêkûpêk pêwîste kontrolê tenduristîya min bê kirin. Lê ev kontrol qet nayê kirin. Her wekî din pêwîste li xwarina min qate be, pêwîstiya min bi xwarina diyetê heye. Lê rêveberî di vê mijarê de qet alîkarî nîşan nade. Ji ber vê xwarina ku ji herkesî tê çêkirin ez dixwum. Ev jî bi awayekî xirab bandorê li min dike. Ji cerga(dema) ku ez ketim girtîgehê heta niha min 16 kîlo da. Ji 16'ê Sibata 2018'an û vir de di saetên jimartînê de ji bo ku em li ser piyan jimartînê bide, cûr be cûr zordarî li ser me tê kirin. Di jimartîna sibeha 18'ê Sibata 2018'an de komek geremol(qerebalix) hîn tu tişt negotibû û rabû êrîşî kesên di odeyê de kirin. Heqaret, gef xwarin, lêdan û sixêf(xeber) li me kirin. Di heman rojê ji bo bûyera derb kirinê me bi daxwaznameyekê serî li revîrê da. Lê me nebîr cem bijîjk. Pihên avêt hemû derê min. Niha li ser tiliyê min, lingê çep, mile min yê rastê û di milê min de şînayî heye. Di roja 20'ê Sibata 2018'an de gerîndeyê(midur) girtîgehê ji bo zabitnameya di 16'ê Sibata 2018'an de hatibû girtin hevdişînek li me çêkir. Gerîndeyê girtîgehê ji me pîrsa ne dayîna jimartîna li ser piyan kir. Me jî got ku: “zaten em 3 kes in, fermanber ev jimartînê kare bi awayekî hêsanî bike. Ji ber vê sedemê em naxwaze li ser piyan jimartînê bidin.” Dîsa me got ku em ji fermanberê ku me di 18'ê Sibata de derb kiriye gilîkar in. Me ji gerîndeyê(midur) re got ku bi awayekî lezûbez lêpîrsînekê destpêkin. Gerîndeyê ku got, tu agahiya min ji vê bûyerê tune ye ji bo raporê me şand cem bijîjk. Bi vê sayê me rapora derb kirine girt. Lê bijîjkê ji me rapor nivîsand dermanê ku êşê dibire neda me. Piştî 20'ê Sibata 2018'an yanî roja ku em bi gerîndeyê re axivî êdî pêkhatina jimartîna li ser piyan qediya. Di şûna wê kişandina kamerayan di hundirê odeyan destpêkir. Êdî nabêje rabe li ser piyan jimartînê bidin. Tenê fermaber bi kamereyan tê odeya me. Qurs, çalakiyên civakî û spor demeke dirêjê nayê kirin. Rojname û kovarên ku em abone ye, li gor însiyatîfa rêveberiyê tê dayîn. Sere kesekî tenê ji bo 6 ya jî 7 pirtûka destûrê tê dayîn. Berî van pirtûkan bide lêkolîn li ser pirtûkan tê kirin. Di van lêkolîna de carna ji ber peyvekê tenê pirtûkan nade me. Nameyên me dereng tê û diçîn. Di lêgerîna ser û binî de bi awayekî tehrîkkar lêgerînê tê kirin. Di hevdişînekê*

*vekirî de ji ber ku di navbera me de maseyek mezin heye, em nikare bi awayekî hêsane hevdû himbêz û suhbet bikin.*”

**Ji gotinên girtiyên ku li jor ji naveroka hevpeyvîna bi wan re hatiye dayîn û peyvên girtiyên wekî din yên ku hevdîtîna bi wan re hat kirin re em birêkevin wê bînpêkirinên mafan bi giştî li jêr bi vî awayî bê rêz kirin;**

- Di roja 15.02.2018'an de di dema êvarî de reqîbên (gardiyar) ji bo jimartinê tîna odeyan dibêjin li gor giştînameya Wezareta Dadê ya ku ji rêveberiya girtîgehê re şandiye, wê êdî jimartin li ser piyan bê kirin û di derbarê girtiyên ku li gor vê tevnegerin de wê zabitname(girtîname) bê girtin û lêpîrsîna dîsîplîne wê di derbarê wan de bê vekirin.
- Di 16.02.2018'an de di dema sibehê saet 08:00'de reqîbên ku tîna jimartinê dibêjin wê jimartin li ser piyan bê kirin. Girtî dema ev sepana navborî napejîrînin, daxuyandîna ku ji aliyê reqîban ve rastî lêdan û êşkenceyê tîna û di derbarê wan de zabitname(girtîname) hatiye girtin. Derbirandîna ku di dema jimartinê de girtiyên di odeyên din de jî rastî lêdan û êşkenceyê hatine û ji wan odeyan dengê qîjîniyê hatiye. Bi heman awayî di jimartina êvarê de jî girtiyên ku jimartina li ser piyan napejîrînin ji aliyê komek qerebalix ya reqîban ve rastî lêdan û êşkenceyê hatine.
- Di roja 17.02.2018'an de jî bi heman rengî rastî lêdan û êşkenceyê hatine û van êrîşan bi awayek birêkûpêk heya sêşema 20.02.2018'an dewam kiriye.
- Hin ji girtiyên ku me bi wan re hevdîtîne pêk anî derbirandîna ku reqîbên ku ketine odeyan berê qet nedîtine û dan zanîn ku komek taybet ya bi awayê " tîma destwerdana bilez" tê binavkirin.
- Reqîbên ku ji bo jimartinê tîna, pêşîn bi kamerayan dikevin odeyan, ji girtiyan re dibêjin wê li ser piyan jimartin bê kirin, li ser vê girtî vê rewşê napejîrînin û bi kamerayan dîmen tê girtin û ev rewş tê tomar kirin. Girtiyan derbirand ku piştî kamera hatine girtin, komek taybet ya ku bi navê tîma destwerdana bilez ya ji 20-30 kesî pêkdihat ketine odeyan û êrîşî wan kirine û bi awayek giran hatine derb kirin.
- Girtiyan diyar kirin ku sepana jimartina li ser piyan li girtiyên nexweş yê li odeyê jî tê ferz kirin. Daxuyaniyên girtiyên rastî lêdan û êşkenceyê hatine nêzî hev û diyar dikin ku gardiyar bi taybetî berê xwe didin girtiyên nexweş û lêdanê li wan dikin. Tê diyar kirin ku di nav kesên rastî lêdanê hatine de girtiyek 70 salî jî heye. Di hevdîtîne bi girtiyan re hatiye kirin de tê diyar kirin ku girtiyek bi navê Nîhat ku paşnavê wî nîzanîna, çavek wî nabîne û destek xwe jî wenda kiriye ev ji aliyê reqîban dihat zanîn jî rastî êrîşê hatiye û bi awayek giran hatiye lêdan. Girtiyê bi navê Yildirim Tunç digel ku nexweşiya wî ya dil hebû jî ji aliyê reqîban derb xwariye.
- Girtiyên bi navê Alan Îbeahîm, Tahir Temel, Erdal Eraslan û Kadir Keser ji ber lêdan û êşkenceyê ji poz, navê û ling ve bi giranî brîndar bûne.
- Nemaze di 18.02.2018'an de roja yekşemê bi awayek pîr zêde rastî lêdan û êşkenceyê hatine û hat gotin ku hin girtiyên ku bi awayek pîr giran brîndar bûne hene. Gotin ku koma taybet ya ketiyê odeyê wan bi awayek pîr xirab derb kirine, heqaretên(tajang) giran û gef li wan xwarine û gefa mirinê li wan xwarine, tîkberên li odeya wan ( mase, kursî hwd.) şikandine û belav kirine. Ji ber vê dibêjin ku tu ewlehiya wan nemaye.
- Dema ku girtiyan ji bo rapora lêdanê bigrin daxwaza hinartina revîr û nexweşxaneyê kirine ji aliyê koma taybet ya ku wan derb kiriye ve gefa "em we dernaxin revîrê, em we nabin nexweşxaneyê, pêwîst be emê we bikujin." hatiye xwarin.

## **RAPORA DERHEQÊ BINPÊKIRINA MAFÊ MIROVAN YA GIRTÎGEHA EWLEHIYA BILIND A JIMAREYA 2. YA XARPETÊ**

- Hevdîtînên ku me bi girtiyan re kir de şûna lêdanê bi awayek berçav ji aliyê me ve hat çavnêrî kirin. Di hevdîtina hat kirin de **di derdora çavê rastê yê Ergin DOĞRU de morahî û ekîmozên zer; di serê tiliyên destê çepê yê Enwer TOPTAŞ de morahî; di ejnûyê(çong) çepê yê Metin Benice de morahî û werimîn hat dîtin. Paşiyê serê Bahattin Keskin ji ber derba girtiye werimandî bûye û li lingê wî jî şûna derb xwarinan hat dîtin.**
- Girtiyan xwestine ku herin revîrê û rapora derb xwarinê bigrin. Lê ev daxwaza wan heya 20.02.2018'an nehatiye pejirîn. Di 20.02.2018'an de jî tenê daxwaza hin ji wan kes ya revîrê hatiye pejirîn. Girtiyan ji gerînendeyê girtîgehê re di derbarê lêdan û êşkenceyê rewşê rave kirine lê rêveberiya girtîgehê ji vê rewşa girtiyan re guhnedêr maye û tu təkiliya gerînendehiya girtîgehê bi vê mijarê re çênebûye.

## **TESBÎT Ê QENAETÊN ŞANDEYÊ DÎ DERBARÊ GIRTÎGEHA EWLEHIYA BILIND A JIMAREYA 2. YA XARPETÊ DE**

- 1- Şandeya me di hevdîtînê xwe de têgihîşt ku di girtîgehê de jimartina bi şeweya îçtimaya leşkeri tê kirin. Kesên ku bertek nîşan dide li ber hewadarkirinê xwêr tê kişandin. Her wekî din girtî rastî êşkenceya fizîkî û heqaretan tên.
- 2- Şandeya me tesbît kir ku bi giştî di bedenên girtiyan de şûna derba(lêdan) heye û bi awayekî rêkûpêk rastî lêdan û êşkenceyê hatine.
- 3- Şandeya me tesbît kir ku girtiyên rastî lêdan û êşkenceyê hatine, sewkî revîr û nexweşxaneyê nehatiye kirin û giyandina girtiyan ji bo mafê tenduristiyê tê asteng kirin.
- 4- Şandeya me derbarê qewimandina lêdan û êşkenceyan de xemsariya rêveberiyê wekî nêzîkatiyek kêfî dibîne û hişyar dike ku ev tişt sûceke. Em bi fikare ku eger ev rewş berdewam bike dê di pêşerojê de bûyerên ne xweş ewê biqewime û ewlehiya girtiyan êdî ewê nemîne.

## **ENCAM Ê PÊŞNIYAR**

- 1- Berî her tiştî mewzûat û polîtîkayên rejîma înfazê ya Tirkiyê, li gorî hiqûqa mafê mirovan ya navnetewî û nemaze gorî mafê girtiyan de pêwîste were guncav kirin.
- 2- Rêveberiya girtîgehê bi tawil bila dev ji êşkence kirina girtiyan berde, li gorî hiqûqa navnetewî û li gorî şewaza ku liyaqî mirovatîyê li ser girtiyan tevbigerin. Ji bo girtiyan bila mafê giyandina tenduristiyê bê saz kirin, bila girîngiyê bide xizmeta tenduristîya parastî. Ji bo kesên ku nexweşiya wan heye û ji derfetên tedawiyê bêpar dimîne, bila gavên berbiçav bê avêtin.
- 3- Şandeya me ji ber bînpêkirina mafê mirovan ya Girtîgeha Ewlehiya Bilind A Jimareya 2. Ya Xarpetê de ji bo bi lêpîrsînek bandor peywirdarên berpirsyariya wan heye bê ceza kirin, endamên dadê dawetî peywira wan dîkin.
- 4- Şandeya me tesbît kir ku di derheqê sazûmanîya girtîgehê, şert û mercên fizîkî û kiryarên nebaş de pêwîste kontrolên îdarî û dadî bi awayekî bandor bê kirin. Em bang hikumetê dîkin ku li gor peymanên navnetewî yê di derbarê êşkenceyê de ji bo mekanîzmeyên netewî û serbixwe çê bike xebatan bimeşîne. Her wekî din ji ber bêdingiya Wezaretê Dadê û Lijneya Lêkolîna Mafê Mirovan ya TBMM'yê di derheqê Girtîgeha Ewlehiya Bilind A Jimareya 2. Ya Xarpetê de bang wan dike ku peywira xwe bi cîh bînin.